

Rojnameya *Şerq û Kurdistan*

Seîd VEROJ

DIYARBEKIR, 28/3 2015 — Rojnameyên ku piştî îlankirina Meşrûtiyeta II. hatine belavkirin, ji wan yek jî *Şark ve Kurdistan* (ko di vê nivîsê de wek bilêvkirina kurdî, em dê wekî *Şerq û Kurdistan* binivîsin) e. Ev rojname li Îstambulê hatîye çapkirin, ciyê rêvebirin û adresa rojnameyê, li ser rûpelê pêşîn weha hatîye lêkirin: “Nuri Osmaniyede 49 numarali daire-i mahsuse.”¹ Di hejmara yekemîn a *Şerq û Kurdistan* de, nûçeya xebata damezirandina Komela Teavûn û Terrakkî ya Kurd jî hatîye belavkirin. Dema em tarîxa neşirkirina *Rojnameya Teavûn û Terrakkî ya Kurdan* û derçûna rojnameya *Şerq û Kurdistê* bidin ber hev, em dibînin ku ev herdu rojname li du hev hatine neşirkirin. Yekemîn hejmara *Şerq û Kurdistan* 20ê Mijdara 1908ê û ya *Rojnameya Teavûn û Terakkîya Kurdan* jî di 5ê Kanûna Ewîl de hatîye çapkirin. Li ser bergê pêşîn ê rojnameyê, Ehmed Şerîfê Hersekî, Bedrîyê Melatyayî û Îsmailê Hersekî wek mesulên rojnameyê û herweha Ehmed Şerîfê Hersekî, mesulmidur û Bedrîyê Melatyayî jî sernivîskarê rojnameyê hatine destnîşankirin.

Her hejmarek rojnameya *Şerq û Kurdistan* çar (4) rûpel e, bi alfabeya erebî û zimanê osmanî hatîye nivîsandin û li beşê kunyeyê hatîye nivîsandin ku “di hefteyêk de du caran tête neşirkirin”² Li gor agadarîyên heyî, nayê zanîn ku ev rojname li ser hev çend hejmar hatine neşirkirin. Îro li ber destê me hejmarên 1, 2 û 5 hene. Hejmara duyemîn a *Şerq û Kurdistan*, 24yê Mijdara 1908ê hatîye neşirkirin. Li ser bergê hejmara pêncemîn (5.) jî, tarîxa 5ê Kanûna Ewîl a 1908ê hatîye lêkirin.

Li ser bergê rojnameyê mottoya (dustûra) “*Ev rojname, teswîra rewşa sîyasî ya Şerqê û şaibeyên Xerbê yên der barê însanîyetîyê de dike*” [*Şarkın siyasi vaziyeti*

¹ *Şark ve Kurdistan*, no: 1, 20ê Mijdara 1908, Îstambul, r. 1. Di nivîsa sereke ya bi navê *İfade-i Mahsusa [Gotara Taybet]* a rojnameyê de ku bê îmze hatîye lêkirin, armanca weşandina rojnameyê û şiroveya dustûra “*Ev rojname, teswîra rewşa sîyasî ya Şerqê û şaibeyên Xerbê yên der barê însanîyetîyê de dike*” [*Şarkın siyasi vaziyeti ile Garbın insaniyete karşı şaibelerini tasvir eden gazetedir*] hatîye kirin.

² *Şark ve Kurdistan*, no: 1, 20ê Mijdara 1908, Îstambul

ile Garbın insaniyete karşı şaibelerini tasvir eden gazetedir]³ hatîye lêkirin. Ev dustûra jorê, ji alîkî ve armanc û xeta îdeolojîka rojnameyê jî dîyar dike; berpîrsyarên rojnameyê, li hemberê nêrîn û nirxên Awrupayî (Xerbî), parastina nirx û nêrînên Şerqî dikin. Di nivîsa destpêk a rojnameyê ku bi navê “îfade-î mahsusa” û bînav hatîye nivîsandin de, îzehata vê dustûra jorê weha hatîye kirin: “Em çima îddîaya şaibeyên Xerbê dikin? Li gor dîtina wan, şerqîyan li Şerqê dîmenek kirêt derxistine holê. Meseleya Şerqê ji alîyê wan ve bi vê awayê tete dîtin. Belê ji ber vê yekê em behsa neheqî, bêşefaquetî, xedir, kîn, mexsed û meyla Xerbê dikin û em dê bikin; ku ev di zahîrê de şîrîn xuya dike lê di rastîyê de şaibeyên wan ji bo însanîyê êşekî giran peyda kirîye.”⁴

Di navê rojnameyê de hebûna peyva “Kurdistan”, nayê wê manayê ku ev rojname ji alîyê rêxistinên kurdan ve hatîye derxistin. Hetanî îro têkilîya wê ya rêxistinî dîyar nebe jî, ev yek nayê vê wateyê ku qethen têkilîya wan a rêxistinî tune bû, mimkun e ku ew bi xwe grubek piçûk bin yan jî bi grub û komeleyek re têkilîya wan hebe. Em dizanin gelek rojname û kovarên ku wê demê hatine çapkirin, bi tamamî nebe jî piranîya wan li ser navê komele û rêxistinan hatine belavkirin. Îro qasê ku tete zanîn *Şerq û Kurdistan*, li ser navê rêxistin û cemîyetekî nebûye. Lêbelê herdu peyvên ku navê rojnameyê pêk anîne, balkêş in. Ji naveroka nivîsên rojnameyê dîyar dibe ku di navê rojnameyê de hebûna peyva “Şark” [Şerq], di manaya dîyarkirina hemû civakên rojhelatî yên dervayê “şarezayîya” Awrupaya Rojava û erdê Osmanî de hatîye bikaranîna.”⁵ Peyva “Kurdistan” jî, ji alîyê aîdîyeta kulturî û cografî ve wek parçeyek ji erdê Osmanî di nav peyva “Şark” [Şerq] de hatîye bicîkirin.

Polîtîka weşandina rojnameya *Şerq û Kurdistanê* li ser parastina “Îtîhadê Osmanî”⁶ bû. Lewra “di *Şerq û Kurdistan* de fikirîyata “osmanîparêzî” serdest bûye û dewra desthilatdarîya Abdulhemîdê II. bi navê “îstîbdatê” hatîye binavkirin. Ragehandina rêvebirîya Meşrutîyeta 1908ê, bi kêfxweşî hatîye

³ *Şark ve Kurdistan*, no: 1, 20ê Mijdara 1908, Îstanbul

⁴ *Şark ve Kurdistan*, no: 1, *Îfade-î mahsusa*, r.: 1, 20ê Mijdara 1908. Bn. <http://www.kovarabir.com/malatyalı-bedri-kurd-ve-kurdistan-sark-ve-kurdistan-sayı-1-20-kasim-1908/>, 15.02.2015

⁵ Serhat Bozkurt, *Bir II. Meşrutîyet gazetesi olarak Şark ve Kurdistan*, Kürt Tarihi, no: 8, İstanbul, 2013

⁶ Îtîhadê Osmanî: Di manaya fikra parastina yekgirtina Dewleta Osmanî de hatîye gotin. Di vê çarçoveyê de sala 1889ê “Cemîyeta Îtîhadê Osmanî” hatibû damezirandin. Ev rêxistin ji alîyê Îbrahîm Temo, Îshak Sûkûtî, Abdullah Cevdet, Mehmed Reşîd û Hîkmet Emîn ve hatîye damezirandin. Bn. Dr. M. Şükrü Hanioglu, *Bir Siyasi Düşünür olarak Abdullah Cevdet ve Dönemi*, weşanên Üçdal, 1981, İstanbul, r. 25

pêşwazîkirin û di naveroka hin nivîsên çapkirî de bextewarîya li hemberê ragehandina Meşrûtiyetê û pêkhatina îdareya nûh hatîye dîyarkirin.”⁷ Bedrîyê Melatyayî di nivîsa xwe ya bi navê “*Kurd û Kurdistan*” de vê yeke weha tîne ziman: “Ev kela bilind a hûrriyetê ku îro hatîye fetihkirin, ji xwe daxwaza me kurdan, hemwelatîyên mislim û xeyrî-mislim bû. Milletê Osmanîye çendek sal in ku bi hesretê li benda Meşrutiyetê bûn. Em dê bi hemû xîret û fîlyata xwe bibin fedekarê Meşrutiyetê.”⁸ Pirsgirêka kurd û Kurdistanê jî li ser bingeha Îtîhadê Osmanî, di çarçoveya pêşxistina îslehatan û mafê perwerdeyîya bi zimanê kurdî de hatîye şirovekirin. Herweha der barê vê pirsgirêkê de, rexne li sîyaseta Xerbî girtine û hatîye gotin ku: “Frenk û welatîyên Frenkî bûyî, daîmî, rastîyê bi yek çavî û eksê wê dibînin, di çapemenîya Xerbî de ‘Teracim-î ahval-î Ekrad’ [Tercumeyê halê kurdan] bi awayê çîroka gulyabanî hatîye neşîrkirin.”⁹

Herwekî me di destpêkê de jî dîyar kiribû ku li ser bergê pêşîn Ehmed Şerîfê Hersekî, Bedrîyê Melatyayî û Îsmâîlê Hersekî her sê bi hev re wek mesulên rojnameyê hatine nivîsandin. Di nav rûpelên rojnameyê de jî herî zêde nivîsên ev her sê şexsiyetan hatine weşandin. Sernivîskarê rojnameyê, nivîsên xwe bi navê Bedrî, M. Bedrî û Bedrîyê Melatyayî nivîsandine. Midurê mesul jî nivîsên xwe bi navê Şerîf, Şerîfê Hersekî û Ehmed Şerîfê Hersekî nivîsandine. Îsmâîlê Hersekî jî, yek ji damezrêner û nivîskarê berdewamî yê rojnameya *Şerq û Kurdistanê* ye. Her çiqas hetanî îro têkilîya sîyasî û rêxistinî ya rojnameyê nehatibe tespîtîkirin jî, nasnameya sîyasî û etnîkî ya berpirsyar û nivîskarên wê, ji alîkî ve meyla giştî ya rojnameyê dide dîyarkirin. Bi taybetî jî nasnameya sernûserê wê Bedrîyê Melatyayî; ji alîkî ve naskirîyê xwendevanên çapemenîya wê demê ye û ji aliyê din ve jî agadarîyên der barê nasnameya wî ya sîyasî û neteweyî de gelek kêman in. Di berdewamiya vê nivîsê de em dê bêtir li ser vê babetê rawestin. Her çiqas heta îro têkilîya rêxistinî ya vê rojnameyê nehatibe tespîtîkirin jî, mimkun e ku ev her sê şexsiyetên namdar bi xwe dendika rêxistinek yan jî grubeke teng bin.

Yek ji nivîskarên balkêş ê rojnameyê jî Mele Seîdê Kurdî ye. Di hejmarên berdest ên rojnameyê de du nivîsên Mele Seîdê Kurdî hatine neşîrkirin; di hejmara yekê

⁷ Serhat Bozkurt, *Bir II. Meşrutiyet gazetesi olarak Şark ve Kurdistan, Kürt Tarihi*, no:8, İstanbul, 2013

⁸ Malatyalı Bedrî, *Şark ve Kurdistan*, no: 1, *Kürdler ve Kurdistan [Kurd û Kurdistan]*, 20ê Mijdara 1908. Bn. <http://www.kovarabir.com/malatyali-bedri-kurd-ve-kurdistan-sark-ve-kurdistan-sayi-1-20-kasim-1908/>, 15.02.2015

⁹ Malatyalı Bedrî, *Şark ve Kurdistan*, no: 1, *Kürdler ve Kurdistan [Kurd û Kurdistan]*, 20ê Mijdara 1908. Bn. <http://www.kovarabir.com/malatyali-bedri-kurd-ve-kurdistan-sark-ve-kurdistan-sayi-1-20-kasim-1908/>, 15.02.2015

de nivîsa “*Kürdler neye muhtacdır?*” [*Kurd muhtacê çi ne?*] bi navê Mele Seîdê Meşhur û di hejmara pêncan de jî nivîsa bi navê “*Kurd Alemi*” [*Alema Kurdan*] bi navê Bedîuzzeman Mele Seîdê Kurdî hatine neşîrkirin. Di dawîya vê nivîsê de hatîye lêkirin ku “mabadi var” yanî “berdewanîya wê heye”. Lê mixabin ji ber ku em nizanin weşana rojnameyê dewam kirîye yan na, ger weşana wê dewam kiribe hejmarên din li ber destê me nînin, lewra em nizanin di berdewamiya vê nivîsê de kîjan babet hatine nivîsandin û di hejmarên pey wê re jî çi cûre nivîs hatine neşîrkirin. Naveroka nivîsên Seîdê Kurdî û Bedrîyê Melatyayî, bi giranî li ser îslehatên nû û perwerdeyîya bi zimanê kurdî ne. Edîtorya rojnameyê, di pêşekîya nivîsa Mele Seîdê Meşhur a bi navê “*Kurd muhtacê çi ne?*” de, piştgirîyeke aşkere dane daxwazname û pêşniyara wî ya ji bo perwerdeyîya bi zimanê kurdî. Di wê kurtepêşekiyê de weha hatîye gotin: “Hezretî Bedîüzeman Mele Seîd Efendî, ji bo pêkhatina perwerdeyîya bi zimanê kurdî, daxwaznameyek pêşkêşî mabeynê (daîreya perwerdeyî) kiribû û di nefîceya vê hewldana xwe de rastê gelek musîbetan hatibû. Em bi neşîrkirina sûreteki vê daxwaznameyê îftixar dikin.”¹⁰ Seîdê Kurdî ji ber vê “daxwazanme”ya ku di nav rûpelên *Şerq û Kurdistanê* de jî hatîye neşîrkirin, ji alîyê dadgeha eskerî ya wê demê ve tête mahkemekirin û ji ber vê yekê gelek musîbet bi serê wî ve têne. Naveroka daxwaznameya wî bi kurtayî ev e:

“Bi biryar û xîreta hikumetê li bajar û bajarokên Kurdistanê xebata dirustkirin û avakirina dibistanan dest pê kirîye, em bi vê yekê kêfxweş û sipasdar in. Lêbelê ji van dibistanan, tenê zarokên aşînayê zimanê turkî îstîfade dikin. Ji ber ku mamosteyên van dibistanan ne weqfê zimanê herêmî û gelek zarokên kurd jî ne aşînayê zimanê turkî ne, ew ji perwerdeyî û medreseyên îlmê ku çavkanîya kemalîyetê ye, mehrum dibin.

... Çareserîya vê yekê ev e: ji bo ku bibe sebebê teşwîq û mîsalek xuyayî, divê li herêmên cûda yên Kurdistanê bi navê Medreset’ül Zehra medrese bêne çêkirin: yek li alîyê Beytûşebabê di ciyê navenda eşîreta Ertûşî de; ya dî di navenda Modkan û Belikan û Sason de; ew a dinê jî li Wanê di navbera Kakan û Heyderan de bin. Divê li her yek medreseyê kêmîrîn 50 xwendekar hebin, hemû mesrefên wan ên rojane ji alîyê hikumetê ve bêtin

¹⁰ Molla Said-i Meşhur, *Kürdler neye muhtaç?*, *Şark ve Kurdistan*, no: 1, Kürdler ve Kurdistan [Kurd û Kurdistan], 20ê Mijdara 1908. Bn. <http://www.kovarabir.com/molla-said-i-meshur-kurdler-neye-muhtac-sark-ve-kurdistan-sayi1-20-kasim-1908/>, 16.02.2015

temînkirin û di van medreseyan de ligel îlmên dînî, îlmên fenî jî bêtin xwendin. Digel sazkirina van sê sazîyên perwerdeyî, divê piştgirîya pêşxistina hinek medreseyan din jî bête kirin. Pêkanîna vê yekê gelek muhîm e, ev, bi maddî û manewî yek ji sebebê girîng ê heyatîyeta dahatûya Kurdistanê temîn dike.”¹¹

Nasnameya sîyasî û etnîkî ya mesulên rojnameyê

Ji nav van her sê damezrêner û rêvebirên rojnameyê; agadarîyên me yên li ser nasnameya etnîkî ya sernûser Bedrîyê Melatyayî bêtir in. Herdu damezrênerên din; Ahmed Şerîfê Hersekî û Îsmâîlê Hersekî jî bi navên cihê cihê nivîsandine û herduyan jî bi hev re paşnavê “Hersekî” bikaranîne. Ahmed Şerîfê Hersekî nivîsên xwe bi navê “Şerîf” û “Şerîfê Hersekî” nivîsandine. Îsmâîlê Hersekî jî, nivîsên xwe tenê bi navê “Îsmâîlê Hersekî” nivîsandine. Nivîskar Îbrahîm Sedîyanî der barê nasnameya etnîkîya “Hersekîyan” de ji pirtûka Kemal İnanç Işklar neqil dike û dibêje; ji her sê damezirênerên rojnameyê didoyê wan yanî Ehmed Şerîfê Hersekî û Îsmâîlê Hersekî kurdên Balkanî bûn, ji Bosna-Hersekê bûn, rojnameya *Şerq û Kurdistan* jî, ji aliyê kurdên Balkanî û kurdên Kurdistanê ve hartîye neşîrkirin.¹²

Ji nav van her sê mesulên rojnameyê **Bedrîyê Melatyayî**, ji aliyê raya giştî û çapemenîya kurd ve bêtir tete naskirin. Ji nivîsa wî ya bi navê “*Kürdler ve usul-i ictimai*” [*Kurd û usûlên îctîmaî*] wisa dîyar dibe ku ew “endamê Îttîhad û Terakkî bû.”¹³ Der barê Bedrîyê Melatyayî de agadarîyên berfireh li ber dest nînin. Li gor agadarîyên lêkolîner Murat Issı ku ji belgeyên Arşîvên Osmanî yên Serokwezîrîyê bidestxistine dibêje: “Navê wî yê eslî Mahmud Bedrî ye. Mahmud Bedrî Beg, kurê Alî Rıza Efendî ye û ew ji malbatek navdar a Melatî ye. Di sala hicrî ya 1293ê (1876-77) de li Melatîyê ji dayik bûye. Ji bo perwerdeyîyê di Ruştîyeya Eskerî ya qeza Hekîmxanê de dest bi xwendinê kirîye, paşê jî Îdadîyeya Kulelî û Mektebê Herbîye xwendîye. Sala 1901-02yê bi rutbeya teymenîyê, şehadetnama xwe ya hejmar 6449 ji Mifetîşê Umumî yê Tedrîsta Eskerîyê wergirtîye. Di

¹¹ Molla Said-i Meşhur, *Kürdler neye muhtaç?*, *Şark ve Kurdistan*, no: 1, Kürdler ve Kurdistan [Kurd û Kurdistan], 20ê Mijdara 1908. Bn. <http://www.kovarabir.com/molla-said-i-meshur-kurdler-neye-muhtac-sark-ve-kurdistan-sayil-20-kasim-1908/>, 16.02.2015

¹² Bn. <http://www.ufkumuz.com/kurt-basin-tarihi-6144yy.htm>, 13.04.2013, Kemal İnanç Işklar, *Bir Şizofrenin Tahlihi: Said-i Nursî Dosyası- 3*, Hakimiyet-i Millîye, 2 Ocak 2011

¹³ M. Bedrî, *Kürdler ve usul-i ictimai [Kurd û Usûlên İctîmaî]*, *Şark ve Kurdistan* [Şerq û Kurdistan], no: 2, 23yê Teşrîna Sanî 1908

wereqa wî ya tercûmeyê hal de hatîye lêkirin ku bi navê *Veliahd yan jî Mahkeme-î İstikbal* pirtûk telîf kirîye û bi navê *Mûjde* rojnameyek neşir kirîye.”¹⁴

Demek di nav eskerîyê de xebitîye, ji ber hin sedemên sîyasî hatîye îxbarkirin û di encamê de hatîye nefîkirin ji bo Qubrisê. Piştî neh mehan, ji Qubrisê reviyaye çûye Misrê. Li wê derê di hin muesesatê sinaî û fennî de îstihdam kirîye û ji beşê taksîm-î arazî û tarîk-î Turkiyeyê şehadetname wergirtîye.

Piştî îlankirina Meşrûtiyeta 1908ê, wekî gelek şexsiyetan ew jî vegeriya Îstambulê û di îdarexaneyên rojnameyan de dest bi xebata çapemenî û nivîskarîyê kirîye. Paşê berê xwe daye karên îdarî; “16yê Tebaxa sala 1909ê li qelema Îstixbarata Asayîşa Giştî de, bi meaşê 1500 qurîşan dest bi kar kirîye. Hetanî 15yê Adara 1910ê li vê derê xebitîye û piştî girtina vê beşê betal maye. 14yê tebaxa 1910ê, di şubeya sêyemîn a heyetê fennîye ya Şaredarîyê de wek muavînê mudir, bi meaşê 2000 qurîşan dest bi kar kirîye. ... Di 14yê Nîsana 1912 de, bi meaşê 1500 qurîşan neqil kirine ji bo sermuhendîsiya Şaredarîyê.”¹⁵

Bedrî, bi nivîsandin û xebata xwe ya di seha çapemenîyê de navdar e û bi zimanê turkî nivîsandîye. Digel zimanê xwe yê nivîsandinê, “aşînayê zimanên arebî, farîsî, ermenî, fransîzî, almanî û îngilizî bûye.”¹⁶ Wî di neşirkirin û belavkirina gelek weşanan de mesulîyetî girtîye. Herwekî ku me li jorê jî dîyar kir, ew, hem xwdî îmtîyaz û hem jî mesulmudirê *Mûjdeyê* bû û navnîşana ciyê rêvebirina *Mûjdeyê* jî îdarexaneya *Şerq û Kurdistanê* hatîye nîşandan. Bêguman xebatên wî yên di seha çapemenî û nivîsandinê de, ne tenê ev bûn. Digel ev herdu berhemên Mehmûd Bedrî yê Melatyayî; xebatên wî yên bi navê “*Kulliyat-ı Nefise [Küçük Dikişler]*, *Kırmızı Kitap [Pirtûka Sor]* û herweha di rojnameyên wekî *Şark*, *Şark ve Kurdistan*, *Rojnameya Teavûn û Terakkî ya Kurd*, *Mûjde* û *Mûjdeya Nû* de jî nivîsandîye.”¹⁷

Têdeyîyên her sê hejmarên rojnameya *Şerq û Kurdistan*

Dema em bala xwe bidin bergê pêşîn ê rojnameya *Şerq û Kurdistan*; em dibînin ku her hejmareke rojnameyê 4 rûpel bûye û qewareya wê qasê kaxizekê A3 bûye, li beşê kûnyeyê digel navê rojnameyê tarîxa çapkirin, peryoda wê ya heftane, navê

¹⁴ Murat Issi, *Ömür boyu süren Osmanlılık serüveni, Bir Osmanlı Kürt Aydını: Malatyalı Bedri*, https://www.academia.edu/930937/MALATYALI_BEDRI, 10.01.2015

¹⁵ J.b.

¹⁶ J.b.

¹⁷ J.b.

mesul, mudir mesul û sernivîskarê wê, motto (dustûr) û bûhayê wê hatine nivîsandin. Piştî kûnyeyê nivîsên nava rojnameyê dest pê dikin. Sernivîsên girîng ên di nav rojnameyê de li jêrê hatine dîyarkirin. Divê em vê yekê jî bînin bîra we ku gelek agadarî û nivîs bi navê *Şerq û Kurdistan* hatine neşirkirin û hinekê wan jî bê nav hatine neşirkirin. Bi îhtimalek mezin ev nivîsên bê nav, ji alîyê redaksiyona rojnameyê ve hatine nivîsandin. Naveroka her sê hejmarên rojnameyê li jêrê hatîye nivîsandin.

Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], no: 1

Tarih-i Tesis 1324-1326, Birinci sene, numero: 1

Şimdilik haftada iki defa neşrolunur

25 Şevval 1326/Hicri (20 Kasım 1908) - Teşrin-i Sani 1324/Rumi

Şarkın siyasi vaziyeti ile Garbın insaniyete karşı şaibelerini tasvir eden gazetedir

Mumesilleri: Hersekli Ahmed Şerif, Malatyali Bedri, Hersekli İsmail

Müdür mesul: Hersekli Ahmed Şerif

Sermuharir: Malatyali Bedri

Meheli Adres: Nuri Osmaniyede 49 numarali daire-i mahsusede

Nushasi 10 paradır.

- *İfade-i mahsuse, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], no: 1, 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1*

- M. Bedri, *Kürdler ve Kurdistan, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], no: 1, 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1*

- Bedri, *Mülkte teferukke tarafdaranine [Osmanlıdan ayrılma taraftarlarına], Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], no: 1, 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1*

- **Siyasi:** Hersekli İsmail, Konferans ve muhtemel sonuçları, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1*

- Şerif, *Muahedat [Anlaşmalar], Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2*

- Mele Seîd Meşhur, *Kürdler neye muhtacdır?, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2*

- Dahili:** *Şark hattı idaresinin [noksanları], Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2
- *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], Bedirhanzadeler,* 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 3
- Hersekli İsmail, *Avusturya Hükümeti ve Habsburg Hanedanının tarihi lekeleri,* *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 20ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 4

Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], no: 2

Tarih-i Tesisi 1326, Birinci sene, 1324, numero: 2

Şimdilik haftada iki defa neşrolunur

29 Şevval 1326, 10 Teşrin-i Sani 1324 (24 Kasım 1908), 23 Teşrin-i Sani 1908

Şarkın siyasi vaziyeti ile Garbın insaniyete karşı şaibelerini tasvir eden gazetedir

Mumesilleri: Hersekli Ahmed Şerif, Malatyali Bedri, Hersekli İsmail

Müdür mesul: Hersekli Ahmed Şerif

Sermuharir: Malatyalı Bedri

Meheli Adres: Nuri Osmaniye’de 49 numaralı daire-i Mahsusede

- M. Bedri, **Siyasi:** *İnsanlar ve tahakkum, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1
- Mülkiye kaymakamlarından Diyarbakırlı Ahmed Cemil, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1
- M. Bedri, *Fransa meşhur tarihçilerinden Mösyö B. Ojen’ün gönderdiği mektup,* *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 1
- M. Bedri, *Şark ve Kurdistan, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r.1
- Hersekli İsmail, *İhtilafat ve neticei mezerresi [İhtilaf ve zararlı sonuçları], Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2
- M. Bedri, *Kürdler ve usul-i ictimai [Kürdler ve toplumsal kuralları], Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2
- Resul Paşa Mahdum İhsan, *Erzurum’da qeth ve ğella, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2
- M. Bedri, *Şark ile Garb, Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan],* 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 2-3

- Sami, *Madaris-i kemalati ûmem [Gelişmiş milletlerin öğretim şekli]*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 3
- Hersekli Şerif, **Dahili:** Taviz ve Bulgaristan, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 4
- Diyarbekir mukkavelat muhariri: Ömer Adil, *Kurdistan muhacirleri*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 4
- Hersekli Şerif, *Bosna'da hicret*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 4
- Mustafa Sümbül, *Serpûş milli meselesi*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 4
- Havadis, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 24ê Mijdara 1908, İstanbul, r. 4

Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan], no: 5

Tarih-i tesisi 1324-1326, Birinci sene, numro: 5

11 Zilkade 1326- 22 Teşrin-i Sani 1324- 5 Kanuni Evvel 1908

Şimdilik haftada iki defa neşolunur

Şarkın siyasi vaziyeti ile Garbın insaniyete karşı şaibelerini tasvir eden bir gazetedir.

Mumesilleri: Hersekli Ahmed Şerif, Malatyali Bedri, Hersekli İsmail

Müdür mesul: Hersekli Ahmed Şerif

Sermuharir: Malatyali Bedri

Meheli Adres: Nuri Osmaniyede 49 numarali daire-i mahsusede

Matbaay-ı Amire

-Bedri, *Medeniyet-i Şarkıye*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 5ê Kanûna Ewel 1908, İstanbul, r.1

-Hersekli İsmail, **Siyasi:** Avusturya hükümeti ve hakkımızdaki maksadı, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 5ê Kanûna Ewel 1908, İstanbul, r. 1

- Bedri, *Fransa: kuvvet ne yapmaz*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 5ê Kanûna Ewel 1908, İstanbul, r. 2

- Hersekli İsmail, Sırbistan Veliahdı (Premsi) Bosna Hersek meselesi, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 5ê Kanûna Ewel 1908, İstanbul, r. 2

- Bediuzzaman Mele Seid-i Kurdi, *Kurd Alemleri (mabadi var)*, *Şark ve Kurdistan [Şerq û Kurdistan]*, 5ê Kanûna Ewel 1908, İstanbul, r. 3

- Zavalı Krdler ve Ermeni vatandařlar, *řark ve Kurdistan [řerq u Kurdistan]*, 5ê Kanna Ewel 1908, İstenbul, r. 3

- Hulase-i telgraf, *řark ve Kurdistan [řerq u Kurdistan]*, 5ê Kanna Ewel 1908, İstenbul, r. 3

28/03/2015, Diyarbekir